*Bi navê dilovanê dilvîn*

# Sîyahpoş Û Çêrista Wî

*Pêşgotin*

Rêka kadiz pirre ji istêr û gerokên geşin ku hêşta ronahiya wan liber hegerên curbercur bi başî negiheştiye me û me ew nenasîne.
Lê eger me bêhnekî fireh hebît û esman jî sahî bît, em bi hûrglî li wê rêkê binêrrin, hindek çirûsk diyar diken ku bo çêtir dîtina wan hewceyî bi emrazên xasme xo heye. Hingê ye ku mirov pêdihesît ew çirûske jî istêr yan gerokekî geşe weke hemî istêr û gerokên dî, ku heta nihe me nedîtiye û ji ronahiya wê bê par mayne.

Li mêjûya edeba kurdî da jî pirr zana, alim, helbestvan, nivîskar û... hene, ku wek istêrek geş diteysin, lê em li ronahiya wan bê behre mayne. Bo nasîna wan me hewceyî bi emirazên lêkolînê heye.
Gelê me, geleke, ku li dirêjiya mêjûyê da, liber hegerên xasim, para pirr nexandî maye. Lê dema mirov li nava xelkê digerît û guhê xo ser axivtinên wanda digirît, pê dihesît ku navê hindek helbestvan, zana û aliman tînne ser ziman ku heta nihe li mêjûya edebî ya nivîskî da çi basek li wan nehatiye kirin û eger hatibîte kirin, hindike. Yan hindek car hindek helbest û babetên edebî tînne ser ziman ku xudanê wan nenase. Bo peyda kirin û nasîna wan helbestvan, alim û zanayan û babetên edebî ku gel, basa wan diket, em dibît lêbikolin;

ku evê şolê jî hewceyî bi demekî dirêj û bêhnekî fireh heye

Nêzîktirîn û hêsantirîn rêka nasîna wan kesayetiyan, melevanî kirin linav behra rûperrên pirrtûkên mêjûyî û edebiye, bîhanî û xoyanî ye. Helbet hertim li vê rêkêra em nagehine desthatekî berbiçav. Îca bo giheştin bi akamê em dibît li nav xelkêda dest bi pirs û pirsiyaran biken û sera refikan û sandqên toz girtiye kevne mala, xasma binemalên xandî û dilsoj biden, çunku ewan çêtir şiyane mîratên rabihorî li agirê xezeba hêrişên dirrindane ye mişka û hilhilînê biparêzin.

Yek ji helbestvanên kurd ku xudan meshefe û meshefa wî dinav xelkêda belav nebûye, belê xelk hindek helbest û xezelên wî tînne ser zar û basa wî diken, "Siyahpoş "e.

Dema mirov bo nasîna Siyahpoş linav pirrtûkên mêjûyî û edebî digerît, tinê hinde dest mirov dikevît, ku helbestvanek kurd hebûye û navê wî jî "Siyahpoş "e û çend helbestên wî jî bi curekî nivîşkan hatine nivîsîn ku ew pêzanîn jî mirov têr naken.

Gelo, Siyahpoş kê ye? Xelkê kîderêye? Çi tiştek li wî bicî maye?

Evana ew pirs bûn ku li mejiyê minda derbas dibûn. Bo peyda kirina bersivê min perên pirrtûkan lêkdan û li du pirrtûkanda rastî navê Siyahpoş hatim.

Pê wan agadariyane suknayî nehate ber dilê min. Min derheq Siyahpoşî li gelek kesê zana, şareza û dunya dîtî û dilsoj pirs kir, lê mixabin li van pêzanînane zêdetir, çi tişt dest min neket. Heta midehekê berî nihe, bi gotina pêşiya; "kev darê ket "ji layê dostekî hêja kopiya sê destxetan, yên

sê hozanivanên kurd "Siyahpoş, Sewadî û Selîmî "giheştine destê min..."[1]

Çend salan piştî nivîsîna babeta jorî û destkevtina hindek agahiyên baştir liser "Siyahpoş "min birryar da, ez wê amade bikem û li gor karîna xo, pêzanînên zêdetir bêxime ber destê xandevan û hogirên edebiyata kilasîke kurdî.
Bo vê mebestê min hewil da ez nivîs û zanyariyên nivîser û lêkolerên kurd, bitaybetî liser Siyahpoş berhev bikem û ronahiyekê bêxime ser jiyan û kesatiya wî. Berî her tiştî em binêrin ka lêkoler û nivîserên me Siyahpoş bi çi awayî dane nasandin û çawa basa çêrista wî kirine û kîşik gotin cihê bavirî û nêzîk li rastiye, ku em bişên dem û cî û dewranê nivîsîna çêrista wî diyar biken.

Mamosta Zeynelabidîn Zinar nivîskarê pirtûka "Nimûne ji gencîneya çanda qedexekirî" dinivîsît: "Yek ji helbestvanên kurd yên bi nav û deng, Siyahpoşe. Herwiha helbest û xezelên di wî bi zargotinî li nav xelkê digerin û jê tê peyvandin. Lê sed heyif û mixabin navê wî jî mîna navê gelek nivîskar û helbestvanên kurd yên din, di şevereşa dîrokê de temartî maye. Heta niha ne nivîskarekî kurd û ne jî nivîskarekî biyanî tîrêjek ruhinî yê bernedane ser û liserê agahdariyek pê bawer ne nivîsiye. Tenê Pirofsor Qenatê Kurdo di Tarîxa Edebiyata Kurdî-1 de, çawa ku me got derbarê wî de bi kurtê hinek nivîsiye û helbesteka wî jî weşandiye. Wê helbestê jî, ji pirtûka Kamiran

[1] - Eve destpêka nivîsînekî min sebaret nasandina " Siyahpoş " ye ku sala 1997 ê li govara "Sirwe" hajmarên 136,137,138 da hate belavkirin ku têda bi berfirehî basa naveroka çêrûngê hatîye kirin û -herwiha paşê jî hemû xezelên Siyahpoş bi her du rênivîsên ebcedî û latîn hatne weşandin.

Bedirxan a bi navê "Fêrbûna Zimanê Kurdî "wergirtiye.
Di nav destnivîsarên berevokên me de pênc bend helbestên Siyahpoş hebûn. Lê di kutasya hindek ji wan de navê "Sewadî "û navê "Suweyda "derbas dibe. Lê di sernavê li pêşî de nav bi "Siyahpoş "e. Îca me nezanî ka ew nav yên wîne yan navên hin kesên din in! "[2]
Hêja "Zinar "paş van gotina her pênc helbestên bas lêkirî ku helbet gelek kêmasiyên wan hene û benda ku li Tarîxa Edebiyata Kurdî-1 ê daye, vê pirrtûkêda belav kiriye.

Hêja Feqî Husên Saxniç, sebaret "Siyahpoş "wiha dibêjît:

"Ji hozan û helbestvanên me yên kilasîk, yek jî "Siyahpoş "e. Vî hozanê hêja bi muxlesî "Siyahpoş "bikar aniye. Herçqas di hinek helbest û beytên xwe de, "Îranî "xebitandiye jî, lê bi giranî "Siyahpoş "li dawiya helbestên wî dixûye. Dibe ku navê wî yê esil ev be; yan jî navekî din hebe. Lê ji vî zêde tu nav bi dest me neketiye. Wisa dixûye ku lêkolîner û lêgerînerê wêjevanên kurd jî, heta dema me ji bilî Siyapoş rastî navekî din nehatine. Heger hatibin jî em rastî wan nehatine. Di nav gel de jî, ew zat bi navê "Siyahpoş "tê nasîn û cur bicur dabaş ji hunermendî û helbestvaniya wî tê kirin.
Ji xwe, nasîna vî zatê mezin û helbestvanê hosta, ne di hindavê hunermendiya xwe de ye û ne jî wekî wêjevanên din bi nav û denge... "[3]

---

[2] - Zinar- Zeynelabidîn- Nimûne ji çanda qedexekirî- çapa pêşî 1991- Suwêd- r 130
[3] - Saxniç- Husên- Dêroka Wêjeya Kurdî- weşanên Enistîtoya Kurdî ya Istenbolê- çapa yekem- 2002- r 431

Rehmetî Saxniç di dirêjiya nivîsîna xwe da, baldikêşîte ser nêrîna Pirofsor Qanatê Kurdo û paşê jî basa mêjûya nivîsîna çêristê ji layê Siyahpoş diket û dibêjît;

... Dîsa ji pênûsa wî, em dûynekê ji destana Seyfulmulûk hildin destê xwe û liser rawestin. Ew dûyin wiha hatiye nivîsandin:

Muelim da bi dest wan lewhê sîmîn
Bi carek elf û bê kirine telqîn

Ji vê dûyna jorîn, rêza paşî, bi hesaba ebcedê reqema 1205 ê derdikeve. Tê gotin ku ev reqem, bi salên koçî, roja nivîsandina destana Seyfulmulûke. An jî roja ji dayîkbûna wîye. Ev roj beranberî 1791 ê zayînî dike. Nexwe ev zat dawiya sedsala 17 dan li cîhanê bûye û ji nivîsandina berheman jî paşve nemaye. Bi vê rewşê û bi van şîroveyan dema jîna wî hate zanîn. Derbarê ji ku bûna Siyahpoş de, gelek gotinên têvel tên kirin... Bi cudayî hinek kesan "Siyahpûş ji gundê dora Sîpanê Xelatê ye "û kesinan jî, ji herêma me ye Farqînê ye digotin... Siyahpûş ji Îranê ye. Lê ji kîjan herêmê ye, belge û şirove bi dest me neketin. Em mecbûrin dîsa serî li gotinên di nav gel de bidin. Giraniya van gotinan liser bajêrê Urmiyê radiwestin...[4]

Rehmetî "Baba Merdox Rûhanî "di pirtûka "Tarîxa Meşahîri Kurd "da dibêjît:

"Muhemmed Cewad Siyahpoş, edîbek zana û helbestvanekî bihêz bû ku li Bexdayê dijî û sala 1246 ê koçî çoye ber dilovanî ya xudê. Ev şair li

---

[4] - Saxniç- Husên- Dêroka Wêjeya Kurdî- weşanên Enistîtoya Kurdî ya Istenbolê- çapa yekem- 2002- r 432-433-434

fenê peyivînê, li wan; medh û qedh û pesindanê, şarezayîyek tam hebûye. Ger ku ehlê terîqetê nebûye, lê bi curekî bêheval keyifa wî, li arifê xudanqedr "Mewlana Xalid "hatiye û lidemê wefata wî da qesîdeyek pirrbar û rewan bi zimanê erebî, pê vê destpêkê vehûnaye;

Xedeynelhewa! Xeffel xelîtul meazid
We itlalu ehbabin heweyte hewamidu [5]

Helbet ev agahî yên Baba Merdûx, pirr giran bihane, kesê berî wî, di pirtûkên dîroka edebiyata kurdî da, basa helbestên erebî ye "Siyahpoş "û navê wî nekiriye.

Di destpêka pirtûka Siyahpoş bi navê "Seyfulmulûk û Melkexatûn " ku Weşanxana Nûbihar çapkiriye, liser jiyana wî viha hatiye nivîsîn:
"Siyahpoş " jî yek ji wan şairên me yên kilasîke, ku di edebiyata kurdî ya kilasîk de çawa di derheqê gelek şairan de agahdarî û nîşanî bi dest me neketine, di derbareyê cihê Siyahpoş lê hatiye dunyayê de jî tiştên ku me piştrast bikin mixabin nînin. Pirofsor Qanadê Kurdo, di berhema xwe Tarîxa Edebiyata Kurdî de hema em bêjin tu agahdariyan nade di derheqê vî şairî de. Derbareyê wextê jiyana wî herçend tarîxa ku me ji vê berhema wî derxistî hebe jî, di derheqê bajar û herêma Siyahpoş de gotinên cûrbecûr hene. Ji gor hindekan ew ji "Diyarbekirê "ye. Ligor Celîlê Celîl û Feqî Husên jî ew ji devera "Urmîyê "ye. Celîlê Celîl dibêje navê wî yê rast "Muhemmed Cewad "e û ew xelkê "Urmiye, Têrgewer, Mêrgewer û Selmasê "ye.

---

[5] - Rûhanî (Şîwa)- Baba Merdûx- Tarîx Meşahîr Kurd- derpêç 1- çapa Sirûş- Tehran 1364(1985)- r 318

Birastî jî mirov herçend di vê babetêde nikare tiştekî bêguman û bê şik bibêje jî, mirov gava berhemên wî dixwîne dihête dîtin ku hitmal heye ku ew ji herêma aliyê Urmiye û Mêrgewerê be. Lewra herçend ev şaire şairek kilasîk be jî di dema jîna wî de li herêma Diyarbekirê ziman û diyalektek wisa hitmalek zeife ku hatibe karanîn. Lê dîsa jî tenê ji ber zarave û devokan mirov nikare şairekî liser cihekê mohir û qeyd bike. Anku di derbareyê cihê ji dayikbûna Siyahpoş mixabin em xwedî agahdarî yên piştrastker nînin... "[6]

Seydayê hêja, Celîlê Celîl jî di pêşgotina pirtûka xo ya Siyahpoş binavê "Seyfulmulûk "da viha basa "Siyahpoş "diket;

"... Yek ji wan hilbestvanan, ku navê wî nû tê naskirin Siyahpoşe. Hunermendek, ku bi hunera xwe ye hilbestvaniyê siteyirkek ronake di govka lîtiratûra kurdaye berfireda.

Navê Siyahpûş heta naka ji rewşenbîrên kurdara him nas bû û him jî nenas bû. Nas bû, ji ber ku navê wî di hine pirtûk û wutarada, rex rêz navê hilbestvanên kilasîkên kurda carina dihate bîranîn. Nenas bû, ji ber ku heta vê paşwextiyê ji hilbestekê, yan jî ji xezeleke wî zêdetir tu tişt ji xwendevanên kurd ra nas nebû, îşaretek û zanistîke berfire li ser jiyana wî û hozanivaniya wî li destê rewşenbîrên kurda tunebû.

Vê paşwextiyê li ser Siyahpûş bi çelengî tê behs kirin. Dastana ûye mezin bi navê "Seyfulmulûk" hiltînin ser zar... Çavpêketina pêşin bi vê destanê ra bandureke xûya li ser zanayan hişt.

[6] - Amedî- Bedirxan- Siyahpoş, Seyfulmulûk û Melkexatûn- weşana Nûbihar- çapa yekê- 2006

Balkêşiya mezin, ku dastan li bal xwandevana pêşda anî, bû rêber û bingeh, ku zanyar û pisporên lîtiratûra kurda, Ebdulreqîb Yûsiv, Ebdulrehman Mizûrî, Reşo Zîlan, Enwer Sultanî û yên mayîn bi wutarên taybetî li ser Siyahpûş di govar û rojnameyên kurdî da pêşda bên, mînakan ji hilbestên wî çap bikin... "[7]

"... Wutarên ku li ser Siyahpûş hatine nivîsandin di bingeha xwe da hev dubare kirin û tiştekî giring ser jiyana wî zêde nakin. Ji wan wutara tê naskirin, ku navê Siyahpûş << Muhemmed>> bûye... Dîsa, ji beytekê em pêdihesin, ku pêşiyê ew li << Îranê>> jiye, lê paşê welatê xwe terkandiye û hatiye Bexdayê... "[8]

Seydayê Celîl, liser war û welatê Siyahpûş, dibêjît;

"... Gotinên zanyara û axavtinên di nava gel da li ser vê pirsê bi hev nagirin. Ebdulreqîb Yûsif û Reşo Zîlan ji melle û zanyarên olê bihîstine, ku Siyahpûş xelqê << Silîvan (Farqînê) >> bûye, ji herêma << Narikê>>. Ji ber vê jî, gorî bihîstina Reşo Zîlan, melle jêra gotine Siyahpûşê Silîvî. Mamosta Cegerxwîn, bi şedetiya Reşo Zîlan, welatê Siyahpûş, Hekarî hesab kiriye. Ser bingeha lêkolîna çavkaniya dîrokî li ser devera Hekariyê û taybetiya ziman-zarava dastanê, Reşo Zîlan tê li ser wê baweriyê, wekî gotina mamoste Cegerxwîn ji bona rast bê naskirin, çavkanî lazmin. Zanyar lêkolînvanên Alman, Yêvginî Pirûm û Albîrt Sotsin, sed û pêncî sal berê dîtineke nû li ser welatê

[7] - Celîl- Celîl-Sîyahpûş, Seyfulmulûk- Wîyen-2000-r5

[8] - Heman jêder- r7

Siyahpûş nivîsîne. Wana ji devê xelqê Kurdistanê bihîstine, ku Siyahpûş xelqê Amêdîyê bûye.
Ser bingeha van malûmatiya, em çar deverên ji hev dûr, ku ew bûne cî-warê Siyahpûş, dibînin: Farqîn, Hekarî, Amêdîyê û Îran. Bi berhevdana van gotina dikarin bên ser bawerîkê. Siyahpûş li dastanêda wek nasnaveke nû tîne ser ziman, ji xwera dibêje "Îranî "...
... Baş zanîna zimanê Farisî, şedetiya wê yekê dide, ku ew yan xelqê Îranê bûye, yan jî demeke dirêj li wê maye. Ji ber kurmanciya wî ya delal dûr nîne, ku ew ji herêma Îranêye bakûr rojavayê, ji der-dora Urmiyayê bûye. Herêma zaravê kurmancî li Îranê, bi giştî dikeve li jorî Urmiyayê, ji aliyê Turkiyayê nêzîkî herêma Serhedê ye... [9]
Seydayê Celîl, herwiha lidor serdemê jîna Siyahpûş, û nivîsîna çêristê, li zarê seyda Ebdulreqîb û seyda Reşo Zîlan dibêjît;
"Li ser dema ku Siyahpûş jiye û hilbestên xwe nivîsîne, hine zanyarî dest meda hene. Ji çavkaniyên erebî tê zanîn ku li sedsaliya nozdê, di nîveka pêşin da li Bexdayê hilbestvanek bi nasnavê Siyahpûş hebûye û navê wî Muhemmed Cewad bûye. Sala mirina wî sala 1247 ê hiciriye (sala 1831 -- 1832 bi hesabê xaçparêziyê). Siyahpûş Muhemmed Cewad mêla wî li ser terîqeta Mewlana Xalid bûye û hilbestek bi zimanê erebî ser mirina Mewlana Xalid nivîsiye...
... Dîroka nivîsandina xwe Siyahpûş bi hesabê ebcedê daye xûyakirin. Reşo Zîlan bi çend rêkan hesabkirina ebcedê cêrbandiye û dîroka sala 1200

[9] - Celîl- Celîl-Sîyahpûş, Seyfulmulûk- Wîyen-2000 - r 9

ê hicirî jê derxistiye. Wek ew dibêje... Derdora salên 1800 ê zayînî, nêzîkî rastiyê ye, ku Siyahpûş dastana xwe nivîsîbe... Pirtûka ku Enstîtûya Kurd ya Istenbolê çapkiriye ji van beyta sala 1205 ê hicirî. (1790 -91 bi saljmêrê xaçparêziyê) derdixe... "[10]

Siyahpoş kê ye? Xelkê kîderêye?

"Siyahpoş " texelus yan navê berniyase helbestvanekî kilasîke dawiya çerxa hejde û destpêka çerxa nozdê zayînî ye. Ew li vê malkê dibêjît;

Munewerkî bi rehmet ya mumeced
Ji nûrê me'rifet qelbê "Muhemmed"

Diyar dibît, navê wî "Muhemmed"e û li dergaha xudayê xwe nizayê diket ku bi nûra me'rifetê (xudê nasînê) dilê wî rohnî biket.

Hate gotin, ku Baba Merdûx di pirtûka "Tarîxa Meşahîr Kurd" da basa helbestvanekê binavê "Muhemmed Cewad Siyahpoş" kiriye û dibêjêt; ewî qesîdeyek bi zimanê erebî paş wefata Mewlana Xalid di sala 1242 ê koçî di pesnê wî da gotiye. Di malikek wê qesîdêda helbestvan işareyî navê "Cewad" diket û dibêjît;

Ecade yera'î fî resai we enî el
Cewad wela yerqî lima ena wacid

(Çi evîndarekî dî, nikarît wek min, "Elcwad" wiha bi xoşikî, şîngêrî yê biket)

Dîsa Baba Merdûx dema basa Mewlana Xalidê Neqşibendî diket navê hejmarek kesan wek xelîfeyê wî rêz diket û didite nasîn, ku yek ji wan, kesek

---

[10] - Celîl- Celîl-Sîyahpûş, Seyfulmulûk- Wîyen-2000- r 10,11

binavê "Seyid Cewad Siyahpoş"e. Baba Merdûx ewî wek edîb û şairê bexdadî didete nasîn.
Xudanê tefsîra "Rûhul Me'anî", "Seyid Mehmûd Alosî "navdar bi "Ebî Sena"ku ew jî neqşî bûye û digel Siyahpoş li serdemkê li Bexdayê jiyaye, di pirtûka "Elfeyz Elwarid"da, ew qesîda ku "Siyahpoş" bo şîngêriya Mewlana Xalid nivîsiye, bi zimanê erebî di 276 peran da şirove kiriye û di destpêka wêda, pesnê helbestvanê qesîdê didet û dibêjît:
"Ev qesîdeye wek heyva çardeşevî, wek xunçeya nebişkivî gelek hûrbînî yên sofîzmê û zanistan li xwe girtiye. Xoşbêjî û rewanbêjî li hev civandine. Ev qesîdeye sertir ji qesîdên Emrulqeys û Emro bin Kulsûme. Nivîsîna xwe da serkêşê wêjeya dewrana xwe bû û di edebê da xudan rolekî baş bû. Seyidekî necîb û neseb xoştivî ji nesla seyidên giranqedr, "Seyid Muhemmed" navdar bi "Cewad"... Wî bi wê helbestê şîngêriya cenabê qutbê bazneya rêberiyê kir. Wî bi vê helbestê bo rêberê rêvîngiya çona ber bi şahê şahan û perwedgarê aferîner kir. Ew zanayê ku kar bi zimanê xwe dikir... Ew xudanê du hikmetên "Zanist" û "Kiryar"ê bû. Ew bo min seyda û rêber û peywendîdar bû. Ewê serweriya zahir û batin qazanc kir... Sûnd bît, eger "camêrî" heyva çarde şevî bît, ew seywana wê ye. Eger "camêrî" gogek bît, ew navend û bazna wê ye. Eger "camêrî" bêjeyek bît, ew avahiya wê ye..."
Seyid Mehmûd herwiha di perê 249 ê da, di şiroveya malika;

Ecade yera'î fî resai we enî el
Cewad wela yerqî lima ena wacid

Dibêjît; "Elcewad" yanî dest vekirî "camêr" û işarete bi berniyasbûna helbestvan di nav xelkêda

ye ku bi "Seyid Cewad Siyahpoş" dihate nasîn. Ew Seyidekî sehîhul nesebe.[11]
Seyid Mehmûd Şukrî Alosî dibêjît; Şêx Muhemmed Seîd kurê Şêx Ehmed kurê Şêx Ebdullah Suewydî, yek ji Şêxîn Neqşibendî, xadmê şerî'eta Muhemmedî, rênîşanderê giregiran, serçav jêderan, ... Helbestek di pesnê pêxemberê islamê (s. x) bi erebî gotiye;

علامات اخلاص الثنآء لها رفع

لجزم انخفاض السول او نصب المنع

نية ينجاب فى مظهر الخفا

سناها اذا فى المصطفى خصها السمع

عنان العلى عهد الولا شافع الملا

مزيح البللا يحيى البلا لو بلا النفع

Ewî, xandina xo bal bab û zanayên dewranê tewaw kir. Berhemên wî "Îsaliltalib Lilmetlûb" li tesewufê da, pirtûkek "Hedîs" û hindek dî. Sala 1180 ê li dayik bûye û sala 1246 ê çoye ber rehmeta xudê û li goristana Kerxê hatiye veşartin. Rehmetî, xelîfî şêxê meşayxa, Şêx Xalid Neqşibendî bû. Midehê çend salan dersibêjê medresa "Cami' ya Dawûd Paşa" bû. [12]

---

[11] - Hesenî Alosî- Seyid Mehmûd, Şêxulislam- Elfeyz Elwarid- şerha qesîdeya Sîyahpoş bo şîngêrîya Mewlana Xalid- sala 1278 ê- pirtûkxana zankoya Pirîston- jimare (3210107793113). Seyid Mehmûd kurê Ebdulla Alosî, navdar bi Ebî Sena Şehabedîn Alosî, xudanê pirtûka Rûhul Meanî fî Tefsîr Quran û Seb'e Mesanî. Alosî bi Şêxul Ulema li Iraqê hatîye nasîn. Sala 1217 ê k (1802 z) li dayk bûye û sala 1270 ê k (1845 z) wefat kirîye û merqedê wî li Kerxê ye.
[12] - Meskilezfer, Alosî, Seyid Mehmûd Şukrî, Metbe'e Adab, Bexdad 1348 k (1930 z), p 80

Seyid Muhemmed Seîd Rawî Bexdadî, ku çerxa 18 ê zayînî li bexdayê dijiya, dibêjît; Şêx Muhemmed Seîd kurê Ehmed kurê Şêx Ebdullah Suweydî, yek ji meşayixên neqşibendî û xadmê şeri'eta Muhemmedî, serkêşê alimên navdar û cihê baviriya bilîmetan, li ber destê babê xo û zanayên dewrana xo rabû. Sala 1180 ê k, li dayik bû. Helbest digotin û qesîdeyek di pesnê pêxember (s. x) gotiye. Pirtûka "Îsaliltalib Lilmetlûb" li tesewufê ya wîye. Ew xelîfê Şêx Xalidê Neqşibendî bû. Dersbêjê "Cami' Dawûd Paşa" navdar bi "Cami' Xizir Ilyas" li layê rojava bû. Sala 1246 ê k, liber nesaxiya taûnê wefat kiriye û li meqbera Kerxê hatiye veşartin.[13]

Govara "Luxetulereb" da, di nasandina Şêx Muhemmed Seîd Suweydî da hatiye nivîsîn; Şêx Muhemmed Seîd kurê Ehmed kurê Şêx Ebdullah Suweydî, sala 1180 ê k-1766 ê z, li dayik bûye û yêk ji rênîşanderê terîqeta neqşibendî bû. Di zanista sîma û tesewufê da kesekê diyar bû û liser destê Şêx Xalidi terîqet vergirtibû. Bal, bab û mamê xo, Şêx Ebdulrehman û kesên dî xandina xo tewaw kir. Midehekî dirêj dersbêjê "Cami' Dawûd Paşa" bû. Pirtûka"Îsaliltalib Lilmxlûb" li dor tesewufê yêk ji pirtûkên wî ye. Helbesta ku di pesnê pêxemberi (s. x) da gotiye li ser zarê xelkê ye. Sala 1246 ê k/1831 ê z wefat kiriye û du kur; Şêx Neiman û Ehmed li wî bi cî mane. [14]

---

[13] - Tarîx Elusrul'ilmîye fî Bexdad, nivîsîna Seyid Muhemmed Rawî Bexdadî, amadekirina Dr.'Imad Ebdulselam Reûf, Darulşuûn Elseqafîyel'ame, Bexda 1997, çapa yekê, p 167

[14] - Luxet Elereb, Govara heyvane, Edebê, Zanistî, Tarîxî, sala 1331ê k (1913ê z)

Umer Riza kehale, berhevkarê llirtûka "Me'cemul Muelifîn" li derpêça sê yê perê 316 ê, li rêza navê "Muhemmed" da basa kesekê bi navê "Muhemmed Suewydî" diket û bêjît; "Mehemmed Seîd kurê Ehmed kurê Ebdullah Suewydî Bexdadî, sala (1180k/1766z) lidayik bûye û sala (1246k/1831z) roja dûyê adarê, li bexdayê wefat kiriye.

Nivîser herwiha dibêjît; Muhemmed Seîd kurê Ehmed kurê Ebdullah Suewydî Bexdadî yê sofî û hedîs nivîs, rênîşanderekî terîqeta neqşibendî bû ku pirtûkek wî binavê "Îsaliltalib Lilmetlûb" li dor tesewufê û pirtûkek "Hedîsê" heye. [15]

Duktor Muhemmed Ehmed Dirnîqe jî di pirtûka "Elneqşibndiye Weleilamiha " perê 141 ê da dibêjît: Muhemmed Seîd kurê Ehmed kurê Ebdillah Siweydî Bexdadî, sala 1246 k /1831 z, wefat kiriye û pirtûka "Îsalultalib " û herwiha pirtûke li ser Hedîsê heye.

Nivîserê vê pirtûkê herwiha basa kesek dî jî binavê "Muhemmed Seîd Cizîrî Neqşibendî " diket û dibêjît; sala (1384 ê k / 1964 ê z) li gundê Serdehla Cizîrê ser bi wilayeta Mardînê wefat kiriye. Ew jî yek ji dûketiyê Neqşibendî bû û nivîsek liser pirtûka "Keşfulqinai Elemsdul "ya Muhemmed Cemîlê Xetîb nivîsiye. [16]

Li govara Iliktironiye "Vêsta" da, derheq Siyahpoş wiha hatiye nivîsîn:

---

[15] - Riza Kehale, Umer- Me'cemul Muelifîn, d 3 r 316, ç 1, Muesisa Resalet, 1993

[16] - Dirnîqe- Muhemmed Ehmed- Elneqşibndiye Weleilamiha- p 141- ç Cirûspirês

Seyid Cewad yan Muhemmed Cewad Siyahpoş, zana, nivîser û helbestvan, kurê Seyid Muhemmed Zeyndîn, Hesenî Necefî xelkê Îranê ye û sala bûn û cihê lidayik bûna wî nediyare. Sala 1247 ê wefat kiriye. Ewî qesîdeyek bo wefata babê xo nivîsiye ku di dîwana wî da heye. Berhemên wî "Mêiraculesrar" li tesewfê, "Dohetulenwarulraiq Mineleşiar" lidor edebê li çend pişkanda, helbestek di pesnê Şêx Muhsinê Esem û qesîdeyek paş wefata Mewlana Xalid nivîsiye ku Seyid Mehmûd Alosî, şirove kiriye.

Heta lêre xûyaye ku "Muhemmed Cewad Siyahpoş"ê ku Baba Merdox dibêjît ehlê terîqetê nebû, û "Seyid Cewad Siyahpoş"ê xelîfê Mewlana Xalid û edîb û şairê Bexdadî her ew, "Seyid Muhemmedê Seîd Siyahpoş", kurê Ehmed kurê Ebdullah Suweydî, zana û edîbekî diyare serdemê xo û rênîşanderê rêvîngên tesewfê, xudanê çêrista Seyfulmulûk û Bediulcemalê ye û roja çarşenbî hejdê remezanê, sala 1246 ê koçî (1831 z) li Bexdayê çoye ber rehmeta xudê. Berhemên wî "Dîwanek", pirtûka "Îsallultalib Lilmetlûb" û "Mêiraculesrar" lidor tesewufê, "Dohetulenwarulraiq Mineleşiar" lidor edebê, pirtûkek liser Hedîsê û çend qesîdene.

Seyid Muhemmed Siyahpoş, di malkek xezela ser navê "Ez nizanim ew çi sûret bû" da, basa "Îranî" bûna xo diket û dibêjît;

Karê şemiê her şewate muhbetê sohtendiye
Lew di sojîtin "Îranî" şubhetê perwaneyê

Herwisa di malika daviya xezela "Elf û bê" da dibêjît;

Me xwar camek şerraba xoş bidest saqî yê me hweş

Wekî min hişt "Îran" û berê xwe daye Bexdayê Êreda helbestvan bi eşkere dibêjêt; "Îranî"ye û li Îranê ra çoye Bexdayê û li çona xo keyif xoşe. Çunku dema çoye Bexdayê "camek şerraba xoş" ji dest "saqî yê mehweş" vexariye. Mebesta Siyahpoş ji "camek şerraba xoş" destiveynana zanîn û xudê nasî û meirifetêye, ku li mekteba "saqî yê mehweş", Mewlana Xalidê Neqşibendî dest xove înaye. Hezretê Mewlana Xalid, zatekî xudê nas û xudan terîqet û rênîşanderê xudê nasiyê bûye.

Siyahpoş bixo dibêjît ez Îranî me û Siyahpoşe. Çêrista xo bi kurmanciya jorî ristiye. Kurmancî axivên sînorê îranê, bilî kurmancên xurasanê, bi giştî şênî yê bakûr rojavaya gola ormî û rojihelata herêma serhedê, li "deşte bêlê" li bakûrê bajêrê "şino"yê, heta "kirrê girîdaxê "cîwarin û li pirraniya wan deveran da binemalên ku bi "Seyid" têne nasîn, hene. Seyid bi giştî dibine du çiq; hesenî û husînî. Seyidên Hesenî tinê li deverên "Mirgewerr, Tirgewerr, Biradost "ê ne.

Kesên ku gotine "Siyahpoş" xelkê bakûr rojavaya bajêrê Urmîyêye, gotinek gelek raste. Heta kesên ku gotine û dibêjin, ew ji "Silîva" û gundê "Nark"ê ye, renge her ew gundê "Narî" ser bi "Silîvana " li devera "Mirgewerr "ê bît.

Ew kesên ku gotine û dibêjin "Siyahpoş" xelkê Farqînê ye, renge mebesta wan ew "Muhemmed Seîdî Cizîrî" bît ku duktor Muhemmed Ehmed Dirnîqe di pirtûka" Elneqşibndiye Weleilamiha" da dibêjît;

sala (1384 ê k / 1964 ê z) li gundê Serdehla Cizîrê ser bi wilayeta Mardînê wefat kiriye.

Sala li dayîkbûn, nivîsîna vê çêristê û wefata Siyahpoş

Seydayê Saxniç ligor vê bendê " Bi carek elf û bê kirine telqîn" bi hisaba ebcedî sala 1205 ê wek sala lidayîkbûn yan nivîsîna çêrista Siyahpoş didete zanîn. Nizanim seydayê saxniç bi çi awayî hisabkiriye û jimara 1205 ê destive înaye. Ligor hisaba ebcedî (bicark 226 + alif û bî 129 + kirine 275 +telqîn 590) hejmara (1220) berdest dibît. Û eger em peyva "kirine" bi "kirin" berçav bigirin, hejmara (1215) derdikevît. Ew jî sala nivîsîna vê xezelê ye.

Umer riza kehale berhevkarê pirtûka "Muicemul Muelifîn" sala 1180 ê wek sala lidayîkbûna Siyahpoş daye diyarkirin. Lê eger em bi hûrî li naveroka vê çêristê binêrin, helbestvan li gelek cihanda bi hisaba ebcedî hindek sal diyar kirine, ku diyar diket lidirêjiya wan salanda ev çêriste vehûnaye û yan ew xezel gotine. Di malika 2187 ê da sala lidayîk bûna xo jî kiviş kiriye. Dema dibêjît;

Digel çengê beyan ke remzê qudret
Bikem guhdarî esrarê wehdet

Benda dawiyê ya vê malkê ligor hisaba ebcedî (bikem 62 + kuhdarî 246 + esrar 462 + wehdet 418) dibîte 1188, ku bi nêrîna min, eve sala lidayîk bûna, Seyid Muhemmedê Siyahpoşe.

Ligor vê malkê;

Bi heqê hurmeta navê Muhemmed
Bibexşî cumle ef'alê mê bed

Bi hisaba ebcedî "bibexşî cumle ef'alê mê bed"(bibixşî 914 + cimle 77 + ef'al 181+ mê bid 46) dibîte 1218 û xûya diket ku Siyahpoş di sala 1218 ê li Bexdayê dest bi nivîsîna vê çêristê kiriye. Wê demê di temenê (30) sî saliyê da bûye. Siyahpoş di malika 1598 ê dibêjît ku Seyfulmulûk paş dazde sala giheştêye baxê Iremê:

Çi miqdar go tu hatî di xurbet
Deh û du sal temam bû go di mihnet

Û li malika 1600 ê da jî dibêjît:

Temam bû yazde sala bê ser û ber
Ku ew winda bûye mislê dilawer

Bi vê gotinî xûyaye dema ku Siyahpoş ev çêriste vehûnaye, yazde sal bûye ku li Bexdayê jiyaye û li mala xo dûr ketiye. Herwiha ligor malika 2471 ê jî dema ku ev çêriste tewaw kiriye pazde sal bûye ku li xurbetê bûye;

Deh û penc bû ku derketye bi xurbet
Ji bab û dê û yaran bûye furqet

Vêca ligor wan agadariyên jorî, xûya diket "Seyid Muhemmed Siyahpoş" sala 1188 ê li dawiya çerxa 12 ê koçî beranber digel sala 1774 ê, li daviya çerxa 18 ê zayînî li bakûr rojavaya gola Urmiyê, li Îranê lidayîk bûye. Di temenê (19) nozde saliyê çoye Bexdayê û sala 1218 ê li temenê sî saliya xoda vehûnana çêrista "Seyfulmulûk û Bedîulcmal"ê destpêkiriye û paş çar sala vehûnana vê çêristê tewaw kiriye. Di roja hejdê (18) meha remezanê, li danê zistana sala 1246 ê û nîviya pêşî ya çerxa 13 ê koçî, beranberê sala 1831 ê li çerxa 19 ê zayînî di temenê 58 saliyê da li Bexdayê wefat kiriye. (18 /09/1246 k, 02/ 03 / 1831 z). Ew li xurbetê dinalît û di malika 2492 ê dibêjît:

Gelek bê çare bûne wan bi dewlet
Wekî min bê newayê camê xurbet

Bi xandina vê çêristê, xûya diket, ku Siyahpoş, bilî zimanê kurdî, şarezayiyek tam di zimanê erebî û turkî da hebûye. Bilî şarezaêya li quran û hedîsan, herwiha agadarê dîroka kevne Îranê û edebiyata kilasîke farisî û erebî bûye.

Siyahpoş li çêrista xoda hindek car bo çêkirina beytê mulemei (beytên çend zimanî) ji zimanê Farisî û Turkî û Erebî jî behre wergirtiye. Bo mînak livan du beytên jêrîn, bi zimanê Farisî û Kurdî û di beyta sêyem da bi Turkî û ya çarê bi Erebî helbest gotiye;

Der eyamê sulêmanê peyember
Di misrêda hebû şahek muzefer

Gehî saz û mey û fincan û saqî
Gehî çeng û xezelhayi firaqî

Zulif û xalên mah rûyan çoq Siyahpoş êdirler
Qorqarim ben qere olse çadir û seywani ma

Fe qultu şê'ir min efnanê min cû'
We kanû cami'eynî qewl mesmû'

Dema mirov li çêristên helbestvanê berî Siyahpoş dinêrît, bi giştî hemûyan, destpêka çêristên xwe bi pesindana xudê û pêxember û paranewa li xudê destpêkirine, lê di vê çêrista Siyahpoş da, ew xûya naken. Eva jî tiştek balkêşe. Gelo dibît helbestvanek zana wek Siyahpoş, bêy pesindana xudê û pêxemberê wî, dest bi nivîsîna xwe biket? Eger ew kar kiriye, bo li berinivîsên wî da nînin?

Me got ku Siyahpoş xudanê çêristekî evîndarî, irfanî ye. Ev curê çêristê li edebiyata kurdî da bê hevale.
Ev çêriste ber vê hindê bê hevale ku aşiq li meişûqek nedîtî aşiq dibît û bo giheştina bi meişuq rêkekê nenas û nediyar didete ber xo û li gelek tarên asî û dijwar derbas dibît û paş dazde salan ku dest ji can û jîna dunyayî kêşaye bi dîdara meişûqê xo şad dibît.
Cura nivîsîna vê çêristê digel hemû çêristên ku di zimanê kurdî da hene, ferq diket. Ferqa wêjî, eve ye ku Siyahpoş mirovekî arife û çêrûngekî evîndarî û irfanî divehûnît û navra li zarê kesayetî yên çêrûngê dest bi niza û gotina xezelan diket. Ku her yek ji wan li cihê xwe da serbixone. Ev karê Siyahpoş bê hevale û berî wî di edebiyata kurdî da nehatiye kirin.
Nimûna vî karê Siyahpoş di edebiyata farisî da jî, tinê "Selman Sawicî" li çêrista "Cemişîd û Xurşîd" û "Ubêyd Zakanî" di "Uşaqname"da, encam dane.
Ev çêrista Siyahpoş ji 2904 malikan, Gaziyekê di 10 malikan, 140 malik di qalibê 13 Xezelan û Qet'e yekê û herwiha Çarîneyekê di çarçova Pêncîneyekê (Muxemes) li 25 malikan, pêkhatiye.
Her wek tête zanîn, hemû çêristên ku hatine nivîsîn, helbestvanan ji çêrûngekê ku berî wan di nava xelkê da hebûye, behre wergirtine û hewîrê wê çêrûngê di qalibê helbestêda vestirîne û ji nû raberî xelkê kirine.

Me lew hatin ji nezimê în hikayet
Ji neqlê rawiyan min kir riwayet

Herwek li wê beyta jorî da xûyaye, berî Siyahpoş ev çêrûnge hebûye û pêştir hatiye riwayetkirin.

Çêrûnga ku Siyahpoş girtiye dest xwe û bo xwe kiriye hecet ku vê çêristê vehûnît û bo nifşên paş xwe bi mîrat bihêlît, çêrûnga "Seyfulmulûk û Bedîulcemal"ê ye ku yek ji çêrûngên "Hizar û Yek şev"e. Çêrûnga "Seyfulmulûk û Bedîulcemal"ê yek ji wan çêrûngaye ku li bîst û yek şevê (şeva heftsed û pênce û heştê ta heftsed û heftê û heftê) Hizar û Yek şevê da hatiye gotin.
Siyahpoş ew çêrûnga wan bîst û yek şeva bi helbest vehûnaye û car-cara jî, hindekê guherînê têxîte nav çêrûngê û heta hindek serborên çêrûngên dî jî li vê çêrûngê zîde diket. Bo mînak; dema şah liber çinebûna zarûya berxo dikevît û fikra paş mirina xwe diket, ji wezîrê xwe dixazît ku biçîte bal Sulêman pêxember û çara hebûna zara ji wî bipirsît. Lê berî ku wezîr bigehîte bal Sulêman pêxember, xudê, bi wehyê Sulêman pêxember haydar diket û Sulêman pêxember jî dema hatina wezîr, sêvekê bo wî bi diyarî dirêket û emir diket, kerek sêvê şah û kera dî şajin bixot û paş wê bi emrê xudê dê bibine xudan zarû.
Lê di çêristê da, şah nizayê diket û paş nizaya wî, wekê Siyahpoş dibêjît, dengek ji xeybê hat, bi vî awayî;

Ji neqlê rawyê ku kir riwayat
Sedayê xeyib hat ez munacat

Sebeb navê Muhemmed ey dil azad
Xudê tu bexşî û dê bidet ewlad

Welî tu jinkê bînî zêde mehbûb
Ku tu şabî bi yûsif şibhê yeiqûb

... Û paşê jî bo jin înanê, munecma berhev diket û ew jî pesna keça şahê Yemenê diden û şah wezîrê xwe dirêkete xastina wê...
Eva pişkek ji çêrûnga "Taculmulûk "ya şeva, sed û heftê ye.
Siyahpoş herwiha li çend cihên dî jî, hindek bûyerên şevên dîtir, bo bi tam û tewaş kirinê, tevî vê çêrûngê kiriye.
Gelo navê rastiye vê çêristê çi ye?
"Seyfulmulûk û Melkexatûn", "Seyfulmulûk û Se'dulmulûk", "Seyfulmulûk"yan wek çêrûnga "Hizar û Yek şevê", "Seyfulmulûk û Bedî'ulcmal"e?
Gelo dema ku berinivîs navê çêrûngê diguherin, em çend dikarin pişt bi emanet parêziya berinivîsa biden? Gelo çêrûnga ku bingehê wê liser evîndariya du aşiq û meişûqa hatiye dariştin, çawa navê wê dibîte ya du hevalan yan du kesayetî yên du çêrûngên serbixo û cuda ji hev? Seidulmulûk hevalê Seyfulmulûkî ye û Melkexatûn keça şahê Qulzemê ye û herwiha kesatî ya çêrûngekî diye, hizar û yek şevê ye. Gelo dema sernavek wiha berçav tête guherîn, em çawa dişên bawriya xwe bi bernivîsa bînin ku naveroka helbestên wê jî neguherî bin? Raste ku Siyahpoş bixo hindek guherîn êxistiye nav çêrûngê, lê ew kar bi zanetî û bo mebestek taybet bûye. Bo mînak; navê wezîrê Asim şah, Faris kurê Salihe, lê ewî bi zanetî "Faris" bikar ne înaye û bedela wî "Salih" bikar înaye. Çunku Salih hem navê pêxemberekê ye û hem bi manaya rizgarkerê" nefs û qewma"ye.
Siyahpoş mirovekî arif bûye û ev çêriste di çarçoveyekî irfanî da vehûnaye û pê vehûnana vê çêristê hewil daye ku bi zimanekî sade û rewan

rêka pirr ewraz û nişîve irfan û tesewufê bi xandewanê xo bidete nasên. Nexşê rêka giheştina murîd bi muradê danaye ber destê xandewanê kurd. Helbjêrê rêka irfanê û evîna mecazî bo giheştin bi evîna heqîqî, dibît paş xandin û fêr bûna zanistên; Serf, Nehw, Mentiq û Heyet, Ustirlab û Bedîi, Beyan, Remil û Nicûm û melewanêkirin di behra Cefirê û Irûzê, şareza bûn li Tefsîr û Ehadîsan û Şerîetê, rêka Terîqetê helbjêrît û li tarên Qebiz û Best û Cezibê derbas bît û li behra Heyret û Eciz û Tesewurê bibihorît û bigehîte meqamê Tezekurê û paşê dest bi Tesewfê biket. Di behra bê daviya Terîqetê da li Evîna Mecazî bigerît û dest li Nefsa Serkêş berdet û li pêgeha Lomekirinê rawestêt. Nefsa Mulheme paş xove bihêlît û derbasî pêgeha Nefsa Mutmeine bît û Rizayê destxove bînît. Roniya Heq li dilê wî şewiq bidet û bigehît Murad û Evîna Heqîqî.

## Gotina dawî

Di dest nivîsekê da binavê "Namey işq " [17] ku nivîskar û xudanê wê nediyar e, helbestên gelek şêx û melayên navdar û helbestvanên kurd, ku pirraniya wan ser bi rêçika neqişîne û hindeka jî di pesn û medha Mewlana Xalid da helbest gotine,

---

[17] - Destnivîsa " Namey Işq " hevalê hêja Koroxlî Kara Aslan berpirsê weşanxaneya " Doz " li Istenbolê gehane destê min.

sê xezelên Siyahpoş û xezelek Mewlana Xalid têda hene. Xezela Siyahpoş ya ku dibêjît;

Ey hebîbê qelb û rûh wey qerarê canê ma
Dê çi bîtin carekê ger tu bibî mêhmanê ma

Paş vê xezela Hafizê Amedî hatiye nivîsîn ku dibêjît;

Tutiyay dîde sazim xak pay niqşbend
Ta biyabem sirr heq ez lutifi şahi niqşbend...

Du xezelên diye Siyahpoş li pêş û paş xezela Mewlana Xalid hatine nivîsîn û wereng nîşan didet ku Mewlana Xalid û Siyahpoş digel yek helbestênî (muşaire) kirine. Helbesta Siyahpoş ya ku berî xezela Mewlana hatî nivîsîn, eva ye;

Ez nizanim ew çi sûret bû me dî der cameyê
Şubhê şemiê suht cergê min wekî perwaneyê...

Û paş wê, helbesta Mewlana Xalidî ku bi farisî ye, û di pênc malikadaye; bi vî awayî:

"Mujde ey Yeiqub bî dil kan Yûsif Kenan risîd
Mihnetî bî muntihaî hicr ra payan risîd

Bazgerd ey can ber leb resîde kan nazinîn
Îsîyi Meryem sifit behri ilaci can risîd

Kûhi xem ber bad dad anki ba badi seba
Ber meşamem bûyi xaki meqdemi canan risîd

Telxeyi dowrani bîkes mehw şud ez dil mera
Çun nişînem ber meşam zan gul xendan risîd

Xalida baxi gulstani sefa bes kun suxen
Kan behari zindeganî xurem û xendan risîd"

Siyahpoş jî bi xezelekî çar malkî, bersiva Mewlana didet û dibêjît;

"Ger tu nazik sor gulî ez biliblê mestaneme
Hûriya li şiklê gulê ez aşiqê dîwaneme

Hûriya firdewsê alî qumrîya baxê cemalî
Ger tu şemi wer şemalî ez eceb perwaneme

Padşahê hile pûşê ews camê sertas nûşî
Ger tu mestî mey firoşî ez teweliyê meyxaneme

Hazirî dergah darem bende ferman guzarem
Çi dixwazî ihtiyacim can feda canê teme"

Seyid Kafî 'Elewî
06/08/2016